# TEORIYA EDEBÎ



Ebdilkerîm ELÛŞ

«Her hewildanek ji bo danasîna teoriya edebî li gor şêwazeke cudaker mehkûmî têkçûnê ye»

*Terry Eagleton*

## Destpêk:

Ger mirov çavên xwe li dîroka edebiyatê bigerîne dê bibîne ku her tim edebiyat bûye cihê gengeşî û navenda kesên lêgerîner û fîlozof. Di hemû qonaxên pêşketinên mirov de, di aliyên hizir û ramanên nirxandinê çi zanistî û çi edebî be de her tim bal çûye ser mirov û berhemên wî. Û li gor her dewreyekê bi nêrîn û boçûnên wê dewrê, bûye mijara nirxandin û tehîlên berfireh.

Ji dewrên yûnaniya kevn û nêrînên fîlozofên wê demê wek Platon, Socrat û Aristo ve, her wiha Horas û Quintillianê romanî. Piştre bi xuyakirina serdema renosansê û derketina klasîkên nû heya sedsalên 18, 19 û 20'an ve, tevî guhertinên civakî, siyasî, olî û çandî ku şoreş bi xwe re pêk anîne, her tim edebiyat û metnên edebî di operasiyonên jihevxistin, avakirin û zarîkirinê re derbas bûne, lewma mirov dibîne û



digihêje encamekê ku bîr û xezîneya mirovahiyê ber bi kamiliyê ve diçe û xwe têr dike. Ji ber wan sedeman jî gelek felsefe, boçûn û teoriyên cuda derketin ronahiyê, mirov dikare bibêje ji bo her dewrekê; hizir û ramanên cuda, nirxandin û pêkanînên cuda derketine.

Ji bo mirov teoriya edebî nas bike û zanibe ji ku an di encama çi tevger û boçûnan de derketiye?! divê di serî de teoriyê fahm bike.

## Teorî:

Jonathan Culler di pirtûka xwe ya bi navê Teoriya Edebî tîne ziman ku teoriya edebî têkiliya xwe bi dahînan û afrandina heye, lewma divê mirov di destpêkê de teoriyê fahm bike. (1) Bixwe wate û maneya teorî pir

*1. Ji semînera duyem a Dr. Haşim Ehmed Zada, Zanîngeha Kobaniyê, Dewra Masterê 2022.*
*2. https://www.academia.edu (Theory of Literature – An Introduction)*
*3. CARTER David, Literary Theory, werger ji îngilîzî Basil El-meselme (2018), Tawîn: Şam. r 6*
*4. ALAN Remezan (2015), Destpêkek ji bo zanista edebiyata modern, Peywand: Stenbol, r 161.*

aloz e, bingeha wê peyvê yûnanî ye, tê wateya nêrîn, bînin an dîtin. Sêmantîka wê jî ne ku dîtina bi çavan, lê mebest jê sêmantîka hizrî ye ango helwest û têgihîştina zihnî.

Prof. Paul H. Fry di semînera xwe ya yekemîn de, bi navê «Introduction» dibêje: ji bo peyva teorî dîrokeke darîştî heye. Li pêvajoyên serdeman wateya teoriyê tê guhartin; li gor serdemên kevn tê wateya piratîk (pratic) weke ku em niha jî bi kar tînin, lê di hin serdeman de jî teorî dihat wateya konsept (concept) ango mefhom.(2) Di vir de jî bi awayekî zelal ji me re tê xuyakirin ew ferqa di navbera her du peyvan de (pratic û concept) ji bo peyva teorî. Ji aliyekî din dergeheke nû vedibe pêşberî mirov ew jî têgeha «Metodology» ye, dîsa ew peyv xwe bi teoriyê re dixe nav toreyekê ku bi hev re wateyekê didin, ew jî ku metodolojî piraktîbûna teoriyê ye.

Her wiha ger mirov bala xwe bide nivîsa David Carter di pirtûka wî ya bi navê "Teoriya Edebî" di bin serenava «Ji bo çi teorî» dibîne wiha nivîsiye: "Tiştê ku mamoste, xwendevan û gel tênegihêştibûn an jî nedixwestin pê itraf bikin ew e ku di rastiya jiyana xwe de teorî bi kar danîn ji bilî ku bizanibim."(3) Mirov têdigihêje ku mebesta Carter ew ku teorî ew asa an rêgezên em di jiyana xwe de bi kar tînin, lê em bi xwe jî pê nefikirîne.

Em lê zêde bikin, Remezan Alan ew jî dibêje: "Teorî şîroveyeke, dixwaze objeya xwe fêm bike".(4) Di encama hin nêrîn û hizrên kesên profesiyonal de weke ew kesên li jor bi nêrînên wan ve hatiye diyar kirin ku teorî ew çemkên babetekî yên bingeh in ku mirov li ser dixebite. Bi awayekî din teorî ew komeleyeke ji hizir, helwestên xurt, pevgirêdayî, kûr, zanistî û felsefî ye li ser babet an mijarekê dixebite. Her wiha ew bi xwe ji bo xwendin û lêkolînkirina babetekî rêgez an rêyên gelekî abstrakt û mucered datîne pêşberî mirov. Ji ber ku xwendina me jî li ser edebiyatê ye divê em ew wateya teoriya edebî zanibin.

## Teoriya Edebî:

Ji bo ku mirov zanibe edebiyat çi ye?! Sedemên derketina edebiyetê nas bike, li ku hatiye derketin û çawa hatiye xwendin, naskirin û şîrovekirin li hemû welatên cîhanê divê mirov teoriyên edebî nas bike û bi kar bîne. Her wekî din teoriya edebî li berhemdar û otorîta edebiyatê jî dixe bin lêpirsînên xwe û li dora wergirtvan re dizivire, ji bo zanibe ew bandor kiriye.

---

*5. EAGLETON Terry, Literary Theory An Introduction, werger ji îngilîzî ber bi erebî Saêr Elî (1995), Şam r 8.*
*6. ALAN Remezan (2015), heman berhem. r 161.*

Mirov dikare bibêje ku ji bilî cureyeke teorîk çiqas lezok û hundirîn be jî, em berhema edebî nas nakin û çawa bixwînin ger em cureyeke teorî nizanibin.(5) Ji wê yekê jî tê naskirin ku mirov bixwaze li edebiyatê bixebite divê teoriyên edebî nas bike. Teoriya edebî ew diyardeyên edebî bi awayekî giştî dike mijara xwe ji bo derxistin, tekezkirin û encamgirtina konseptên giştî da ku rastiya edebê û bandora wê xuya bike. Her wiha hewil dide bersivên kamil ji edebiyetê re bibîne li gor felsefeyeke diyar û naskirî. Ji ber wê ji bo xwendin û nirxandina edebiyatê divê têgiheştineke teorîkî hebe û her sê bingehên berhemên edebî berçav bê girtin (afrînerî – metin – wergirt) lewma mirov nas dike xebitandina li ser edebiyatê xwe dispêre komeleyek ji şayesandinan. Remezan Alan di pirtûka xwe ya binavê «Destpêkek ji bo zanista edebiyata modern» de dibêje: Teoriya edebî wek xwendina metnekê ya li gor hin prensîb û disîplînan e.(6) Yanê li gor rêberiya hin zanistan, xwendinek derdikeve meydanê. Mirov jê têdigihêje ku ew şîroveyên derbarê metinê de muhtacî çarçoveyekê ye.

Lewma mirov mirov dikare wisa binirxîne, teoriyên edebî girîngî dide van warên lêkolînê:

**1-** Lêkolînkirina avabûn û derketina edediyatê bi rêya têkiliya di navbera edebiyat û afrîner ve.

**2-** Di encama taybetmendiyên metinên edebî û pêkhateyên wê de, lêkolînkirina edebiyatê.

**3-** Lêkolînkririna erk û fonksiyona edebiyatê bi rêya têkiliya di navbera edebiyat û wergirt (receiver) de.

Teoriya edebî li ser edebiyatê behs dike û ji mirov re çêbûn, geşedan û guhertinên edebiyatê dide zelalkirin, her wiha behsa aliyên berfireh ên giştî yên edebiyetê dike.

## Çêbûn û derketina teoriya edebî:

Reh û rîşeyên teoriya edebî heya serdema yûnaniyan vedigere, lê ew bi awayekî akedemîk nehat xwendin heye nîva sedsala 20’an.

Ger mirov xwe di nav dîroka edebiyatê de bigerîne, dibîne ku rîşeyên teorî li cem fîlozofên mîna Platon û Aristo heye, her du li ser mimisesê (teqlîd) xebitîne û nêrînên cuda jî dane, ev rewş jî di serdema romaniyan de jî xuya dibe ku teqlîdkirina yûnaniyan dikin. Ev rewş jî heya sedsalên 18, 19’an dewam dike û hin teoriyên edebî derdikevin di bin bandora hin hizir û ramanên wê demê, weke mînak; teoriya civakî bi Madame de Stael re, her wiha di sedsala 19’an derketina felsefeya sosyolojî bi Hegel û bandora wê li hemû cîhanê. Piştre teoriya derûnî (psychology) bi Freud re. Ev rewş di bin hin tevger û hiziran de dimîne



heya destpêka sedsala 20'an gelek guhertinên civakî, siyasî û aporî diqewimin. Ew guhertin berdewam dikin heya nîva sedsalê bi xwe re bandorê li hemû cîhanê dikin û rehên wê vedigere Fransayê, ger mirov wan guhertinan jî nas bike dê teoriyên edebî jî nas bike.

Lê gelo ew guhartin çi ne? Di gulana 1968'an de serhildanek xwendekaran li Fransayê çêbû, di bin dirûşmeya (Qedexekirin qedexe ye) ango nabe tiştek fikirên wan bisînor bike. Dengvedana vê serhildanê li hemû cîhanê kir, di wê serhildanê de Jacque Derrida û Michel Focualt jî beşdar bibûn, ew her du teorîsyenên binavûdeng in.

Lê pirsa ku divê mirov ji xwe bike çima li wir û di wê demê de? Di salên şerê cîhanê ya duyem 1939-1945'an de malwêraniyên mezin û kuştin bi milyonan çêbûn; piştî wî şerî pêşketinên aborî jî çêdibin, welatên kapîtalîst û sosyalîst dewlementir dibin, ew jî dibe sedema ku tekneloji zêde bi pîş dikeve û hejmara nifûsa bajaran jî zêde bibe, ev jî derfeta xwendinê ji çînên hejar û burjiwazên biçûk re vedike her wiha hejmara xwendevanan li zanîngehan zêde dibe. Piraniya xwendekaran beşên zanistên mirovî û civaknasîyê dixwînin. Ew jî dibe sedema serhildanê. Rewşa baş a aborî dibe hoker ku hejmara xwendekaran li her derê zêdetir bibe û zanistên mirovî bixwînin. Û hejmara xwendekaran li Fransayê ji 100 000'î di 1945'an de dibe 650 000 di 1960'î de. Ji ber wê jî ramanên xwendekaran pir xurt dibin û hêdî hêdî ew teorî derdikevin.

Yek ji hokerên derketina teoriyê, alîkariya xwendekar û karkerên Fransayê. Li piraniya welatên Ewropayê rewşa şoreşekî xuya dibû. Her wiha karkirda ziman û metn û ravekirina wan tê guhartin. Yek ji hokerên din lawazbûna pîvanên baviksalarîyê di nava malbatê de, xurtbûna rola jinan li civak û zanîngehan û derketina şepêla duyem a femînîzmê, her wiha bandorê li ser edebiyatê jî dike. Rizgariya koloniyên berê li Asiya û Afrîkayê, her wiha Çîn, Hindistan û welatên din ên cîhana 3'an. Ev jî dibin sedem û bandorê li edebiyatê dikin. Û cureyên teorî yên modern û postmodern derdikevin. Weke structuralism, rexneya nû, postkoloniyal… hwd

## Teoriya edebî û zanistên din:

Teoriya edebî têkiliya edebê bi hunerên din, guhertinên felsefî û halûmercên civakî, siyasî û aborî ber çav digire. Ew hizirên ku teoriyên edebî pê bang dike ne nû ne, lê di vê sedema dawî de gihaştiye kamiliyet û têgiheştineke giştî û tam. Ew pêşketin û werara felsefî bandoreke rasterast li ser teoriyên edebî kir. Pêwandiyên xurt ên navbera teoriyên edebî û zanistên serdemê. Her dem pêwendî heye, her wiha pirsa edeb çi ye û gerek çawa bê xwendin, her dem hebûye.

Li dawiyê mirov dikare bibêje ku Teorî aliyê abstrakt a edebiyatê ye, her wiha rexne jî aliyê edebiyatê ya pratîkî ye (nirxandin, analîzekirin). Lewma ger mirov baş teoriyê nizanibe, nikare baş kirîtîk (rexne) jî bike. Mirov têdigihêje ku teorî qala edebiyatê bi giştî dike û rexne jî aliyê pratîkî ya bikaranîna wan teoriyan li ser şîrovekirin, analîzekirin, ravekirin û tefsîrkirina metnên edebî dike.


***Çavkanî:***

1. *EHMED ZADA Haşim, Semînerên xwendina masterê 2022: Zanîngeha Kobaniyê.*
2. *EAGLETON Terry, Literary Theory An Introduction, werger ji îngilîzî ber bi erebî Saêr Elî (1995), Şam.*
3. *ALAN Remezan (2015), Destpêkek ji bo zanista edebiyata modern, Peywand: Stenbol.*
4. *CARTER David, Literary Theory, werger ji îngilîzî Basil El-meselme (2018), Tawîn: Şam.*
5. *CULLER Jonathan (1997), Literary Theory, werger ji îngilîzî Reşad Ebdilqadir (2004), Şam.*
6. *https://www.academia.edu (Theory of Literature – An Introduction)*